



## Ji Tevgera Netewî ya 1925an Portreyên

Di vê kitêba bi sernavê “Ji Tevgera Netewî ya 1925an Portreyên Şophiştî-II” de, behsa hinek ji serkirde rêvebir û rewşenbîrên tevgera serhildana neteweyî ya 1925an tête kirin.

dom»R:6



## Azadîxwaziya jinan ji kevnar ve heya niha!

Lêmêzekirinek bi ser dîroka tejî serweriya netewa Kurd û ew xebat û tekoşînên ku wê netewê bi hemû çîn û qatên vê ve bo gihîştin bi rizgariyê kirine, cîhanek ji xwederbasbûn û qerhemantî û girîngtir ji hemûyan fîdakarî û jixwederbasbûna me dide xuya.Xebata netewayetî li Kurdistanê, xebateke çendînalî bûye û kesê Kurd hemû hewla xwe bo biencamgihandina vê xebatê bi kar aniye û her vê . . . .

dom» R:7

*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (484)20-12-2024Buha (1000) Tûmen*



## Piştevan û penaha çeperê

Rewşa jinan di hemû serdeman de li welatên cuda, ji hev cuda bûye. Rast e berî hatina Îslamê, çanda xelkê li Îranê cuda bû lê dîsa jî di gelek serdeman de jin rastî zulmê dihatin. Wê demê Kurdistan, beşek ji Îrana nû yan jî welatê Pars ê wê serdemê nebû. Rewşa jinan li welatê Mad û Mezopotamya ji rewşa wan li bal Part hinek çêtir bû.

dom» R:5

# Rêzdar Mistefa Hicrî bi hilkefta 26ê Sermawezê Roja Pêşmerge û Alaya Kurdistanê peyamek belav kir

**Mistefa Hicrî: “Hêza Pêşmergeyê Kurdistanê û Ala, du sermaye û remza şûndaner li xebata netewiya Kurdistanê ne.**

Rêzdar “Mistefa Hicrî”, berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 26ê Sermawezê Roja Pêşmerge û Alaya Kurdistanê peyameke pîrozbahiyê belav kir

**Deqa peyamê wiha ye:**

26ê Sermawezê Roja Pêşmergeyê Kurdistanê û Alaya Kurdistanê pîroz be!

26ê Sermawezê li pêvajoya xebata netewî-dêmokratîka netewa me de, hilkeftek bi nirx û taybet e.

Hem roja Pêşmergeyê Kurdistanê û hem roja bilindkirina Alaya Kurdistanê li Komara Kurdistanê ye ku pêwendiyeke rasterast û tejî wate bi hev re û li nav tevgera mafxwazaneya Kurdistanê de hene.

Hêza Pêşmergeyê Kurdistanê, wek rêkxistinek



xwedî pirensîp û hêzeke alîkarder, Ala jî wek hêmaya serweriya neteweyek, du sermaye û remza şûndaner li xebeta netewiya Kurdistanê ne.
Li vê hilkeftê de pîrozbahî li hemû xelkê xweragir ên Kurdistanê, Hêza Pêşmergeyê Kurdistanê, malbatên serbilind ên şehîdan, girtiyên siyasî û kêmendamên çeperê dikin.

**Mistefa Hicrî**
**Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**26ê Sermaweza 1403 a Rojî**



## Bandora potansiyela Donald Trump li ser Rojhilata Navîn

R:8-9



## Di vê demê de ji bo Kurdan girîngiya guhertina paradîgmayê ye

R:4

# Peyama Hêza Pêşmergên Kurdistanê bi hilkefta roja Ala û Pêşmerge




**Xelkê hişar û mafxwazê Kurdistanê!**

**Pêşmergeyên xebatkar ên Kurdistanê!**

26ê Sermawezê, roja Ala û Pêşmergê Kurdistanê li hemû pêşmergeyên li çepera xebat û hemû qatên civaka Kurdistanê, bi taybet malbatên serbilind ên şehîdan, pêşmergeyan û girtiyên siyasî pîroz be.

Li rojjimêra rojî de 26ê Sermawezê bi navê du destkevt û hêmayên tevgera netewiya Kurd, Ala û Pêşmergê Kurdistanê hatiye diyarîkirin ku her du destkevtên bilind û sembolîk ên Komara Mezin a Kurdisdtanê ne.

Diyarîkirina roja 26ê Sermawezê wek roja Pêşmergê Kurdistanê ku bi armanca rêzgirtin li xebeta tejî serwerî ya Hêza Pêşmegê Kurdistanê bûye, bû biryarek li duyemîn plonoma Koîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ku piştî kongireya 6 a Hizbê vedigere ku binyat û bîranîna vê, pêwendî bi bilindkirina Ala ya Kurdistanê li sala 1324ê ve heye.

Bi curekê ku bi bîranîna hildana Ala ya Kurdistanê bo yekem car li Mihabadê bû pênase û rêzgirtin li rola xebatkarane û parêzvanên Hêza Pêpşmergê Kurdistanê û bo careke din û heta niha Pêşmerge û Ala wek duyên jihevneqetiyayên tevgera Kurdistanê bi hev re û li rojekê de rêza taybet li wan tê girtin.



Li vê derheqê de piştî serkevtina şorişa gelê me li Başûrê Kurdistanê, Parlemana Herêma Kurdistanê jî li ser hemen binyata îşarepêkirî, 26ê Sermawezê wek Roja Ala ya Kurdistanê erê kir.

Pêşmerge û Ala Kurdistanê, karlêkeriyeke kûr li ser kesayetî û avakirina tevgera xwedî nasnameya netewî daniye.

Hekî bûn û bilindkirina Ala ya Kurdistanê wek nasnameyek bo xwenasandina xelkê Kurdistanê wek netew, seha bawerîbixwekirineke giştî li civaka Kurdistanê de çêkirye û tevgereke mafxwazaneya tejî ewraz û nişîv bi rê ve biriye, Hêza Pêşmergê Kurdistanê li ser pêgeha hewldan bo parêzvanî li ax û xelkê vê niştimanê, bi dehan û sedan hemaseyên qehremanane tomar kirine û bi hezaran pêşmerge li vê şehîd û birîndar bûne.

Lewma Pêşmerge û Ala ya Kuristanê, tenê nav û nîşanek asayî û sade nînin, belku mana û hêmaya taybet a xebata neteweyekê ne ku li ser binyata pêwajoyeke dêmokratîk a mafxwazane, hatine avakirin.

Pêşmerge nasînerê pêvajoyeke berdewam a tekoşîn li pêxema azadî, serbestî û mafê diyarîêkiirna qedera neteweyekê ye ku bi dirêjahiya dîrokê, înkar ji bûna vê hatiye kirin, Hêzek ku bi dîtingeheke Kurdistanî, li xizmeta berjewendiya neteweyekê de ye û wek hêzeke meydanî, heta niha jî amadeyê berevanî û berxwedanê ye.

Îro hevdem digel bilindkirina Ala ya tekoşîn û xebata mafxwazaneya netewiya me, rêz li xebat û tekoşîna kesanekan digrin ku bê beranber û can li ser dest, bo man û parêzvanî ji ax û xelkê Kurdistanê, amade bûne ku mezintirîn sermayê jiyana xwe anku “can”ê xwe fîdayê niştîman bikin, ku bo gelê wan cihê serbilindî û şanazîkirinê ye.

Xebat û xizmeta vê hêzê bi tevgera netewî li Kutrdistana Îranê, li hemû qonaxên, serdema Komara Kurdistanê, qonaxa zêrîn a tevgera salên 46-47ê, serdema piştî herifîna rêjîma paşatî û serkevtina şorişa gelên Îranê û heta niha, xwedî bandor bûne û nayên jibîrkirin.

Bo Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ku li diyarîkirina nav, çêkirin, binyatdanîn û diyarîkirina her yek ji wan destkevt û hêmayên bingehîn ên netewî wek, hildana Ala Kurdistanê, avakirina Komara Kurdistanê, avakirina spaha millî ya Kurdistanê û diyarîkirina navê Hêza Pêşmergê Kurdistanê, danîna sirûda netewî û bi fermîkirina zimanê Kurdî û gelek destkevtên din ên netewî de rola yekem û bingehîn hebûye, aweirdana bi vê rojê û bi bîranîn û pênaseyan, şanasî û serbiloindî ye.

Lewma bo careke din li 26ê Sermaweza 1403 a Rojî de roja Ala û Pêşmergê Kurdistanê, tevî şanazîkirin bi dîroka tejî destkevt û qurbanîdana Hizba Dêmokrat, biryardana li ser diyarîkirina vê rojê û bi bîranîna vê, bilind û pîroz dinirxînin.

Li vê derheqê de li cihê xwe de ye ku tevî bilindnirxandina rola Hêza Pêşmerge li 4 aliyên Kurdistanê ku her yek pêka sirûşta xebat û tekoşîna xwe li her beşeke welat de, rola wan li berevanîkirin û parastina destkevtan de hebûye, bi boneya 26ê Sermawezê, roja Ala û Pêşmergê Kurdistanê li wan pîroz bikin.

**Roja Ala û Pêşmeregê Kurdistanê li hemû xelkê Kurdistanê û Hêza Pêşmerge pîroz be**

**Navenda Hêza Pêşmergê Kurdistanê**

**Sermaweza 1403 a Rojî**

# Dîtingeha Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat li derheq bûyerên li Sûriyê




Li berdewamiya kombûnên pêywendîdar bi hilsengandina rewşa welatê Sûriyê, Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, roja Duşemî 20ê Sermaweza 1403 a Rojî, beranber bi 2024-12-10 a Zayînî, li kombûneke din de rewşa Sûriyê piştî herifîna rêjîma Bneşar Esed û pêşhatên siyasî li wî welatî, gengeşe kir.

Piştî berhevdan û hilsengandina rewşa siyasiya deverê û bûyerên li Sûriyê û Rojhilata Navîn û dîrok û derbasbûya wan pêşhat û bûyeran, Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat li çend xalan de beşek ji hilsengandin û şirovekirinên xwe ragihandin ku ewin:

- Dîrokê daye xuyakirin ku dîktator her çi qas zordar û tepeserker bin û siyaseta zor û serkutkirinê bigirne ber xwe bo evê ku temenê xwe dirêj bikin, li dawiyê de li hember îradeya xelkê û hevkêşên siyasî û dijberan de şikestê dixwen û qedera wan herifîn û revîn e.

Malbata "Esed" jî piştî 54 sal desthilatdariya sitemkarane bi ser xelkê Sûriyê de cuda ji qedera hemû dîktaroran nebû ku li dîrokê de xelkê xwe serkut dikirin û tepeser dikirin.

Lewma tişteke sirûştî bû ku ew şêwaza desthilatdariyê, rojekê bi dawî bê û îradeya gel bi ser zordarî û sitema dîktator de bi ser bikeve.

- Şêwaza desthilatdariya Beşar Esed, piştguhavêtina xwest û daxwaziya xelkê Sûriyê û serkutkirina bêrehmane û heta rêpêdan bi rêjîmek dîktatortir ji xwe wek komara Îslamiya Îranê bi armanca parêzvanî ji desthilata xwe û serkutkirina azadîxwazên welat bû ku encama vê ev bû ku Beşar Esed û rêjîma wî, tûş bûn.

Komara Îslamiya Îranê tevî bi heder-dana dehan milyard Dolar li darayiya xelkê Îranê û amadebûna serkutkarane li Sûriyê li ser daxwaziya Beşar Esed, zêdetir ji 12 salan bû tevî serkutkirina xelkê dijberî Esed, bi destek vekirî destêverdan li karûbarên navxweyê wî welatî dikir û kiribû pêgeh û navendek bo avakirin û perwerdekirina girûp û taqimên curbicur ên çekdarên terorîstî.

Karbidestên Komara Îslamiya Îranê bi eşkere welatê Sûriyê bi kûrahiya stratejiya xwe û pêgehek bo pêşxistina bernameyên xwe yên serbazî li beraye li jêr navê "moqawimet" dizanî.

Lewma dibe ku herifîna Beşar Esed û rêjîma wî, bi beşek ji encama zêdexwaziyên Komara Îslamî û bi pêşvebirina siyaseta şerxwazaneya vê li Sûriyê, ku tevlî serkukutkirina gelên li wî welatî bû, bînin hisêb.

- Tevî ku proseya bûyeran li Sûriyê aloziyên taybet bi xwe hene û heta niha jî dîtingeh û helwêsên civaka navnetewî û welatên xwedî bandor li ser vê proseyê, gelek rohn nînin, lê girîng ev e ku gelên Sûriyê dersê ji dîrokê verbigrin û bi çavronî û bi berçavgirtina taybetmendiyên binyatî yên welatê xwe, pêkhateya welat ku ji gelan û olên cuda pêk hatiye, hêz û aliyên siyasî yên wî welatî bi awayekî berpirsane reftarê digel rewşê bikin û hizir ji avakirina Sûriyê, li paşerojê bikin.

Bo vê yekê jî dibe ku xelkê wî welatî bi berçavgirtina rastiyên civaka xwe, kar li ser qeder û paşeroja welatê xwe bikin.

Kar bo pêkanîna sîstemek siyasî-dêmokratîk ku mafê hemû pêkhateyan bê parastin û desthilatek bersivderê xwest û daxwaziyên xelkê ava bikin û wek derfetek dîrokî mêzeyê guherînnan bi taybet dawîhatin bi amadebûna serbazî û destêverdanên rêjîma Komara Îslamiya Îranê li welatê xwe bikin û bi destê xwe, qedera gel û welatê Sûriyê, diyarî bikin.

- Mafê xelkê Sûriyê ye ku daxwaza lêpirsîn û dadgehîkirina malbata "Beşar Esed" bikin û bi eşkerekirina belgeyên wan hemû cinayetên li derheq xelkê Sûriyê, azadîxwazên welat û girtiyên siyasî û cudabîran kiriye, bo dadgehê rabikêşin û bi siza bigihînin.

Li hemen demê de em bi mafê xelkê Sûriyê dizanin ku li hember hemû serkutkirinan û xiyanetên ku rêjîma Îslamiya Îranê mil bi milê hêzên serkutker ên beşar Esed bi wan û welatê wan hatiye kirinê, li civaka navnetewî de skalayê bi ser wan tomar bikin.

- Gelê Kurd li Sûriyê ku li çend salên derbasbûyî de tevî fîdakarî û qurbanîdaneke gelek zêde ceribandinek li "desthilata xwebirêveberî" bi dest ve anîne, hewceye bi şirovekirin û bi berçavgirtina rewşa taybet bi Rojavayê Kurdistanê, parêzvanî li destkevtên xwe bikin.

Hêzên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê li vê rewşa ku bi serê wan de hatiye, tevî xebitîn bo pêkanîna yekîtî û vekhevî li nav xwe de, bi hişayariyê ve reftar digel derfetan û gefên li ser xwe bikin.

Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê tevî pîrozbahîkirin li gelên Sûriyê û şermezarkirina serkut û cinayetên rêjîma Beşar Esed, hêviya cihgîrbûna aşitî û azadî li Sûriyê, hemû gelên li jêr desthilata reş a komara Îslamiya Îranê erxahîn dikin ku qedera dîktatoriya li Îranê jî wek qedera wan hemû dîktaroran dibe ku herifîn û bo hertim rûreş man.

Bo bidestveanîna daxwaz û hivîyên xelkê Îranê, hewce ye ku hêzên siyasî yên dijberî rêjîmê, bi awayekî berpirsane kom bibin û bi girêdana hêz û giraniya xwe digel hêz û îradeya hertim qahîm a gelên welat, erkê xwe bi cih bînin.



# Di vê demê de ji bo Kurdan girîngiya guhertina paradîgmayê ye



**N. Kawe Ahengerî**
**W. Hesen Mukerem**



Nêrînên siyasî heta destpêka sedsala 21`an bi giranî di navbera aliyên çep û rast de hatine dabeş kirin.

Piştî Şoreşa Rûsyayê ya sala 1917`an ev parçebûn zêdetir derket û heta dawiya sedsala bîstan li cîhanê belav bû..

Kurd weke neteweyeke bê dewlet û Kurdistan jî weke nîştimanekî parçebûyî ji vê parçebûna îdeolojîk bêpar nebûne.

Ya herî girîng jî, piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, hikûmeta navendî ya Tehranê bi rastî tu hêzek li ser Îranê nebû û welat di navbera her du hêzên cîhanê, Yekîtiya Sovyet û Brîtanyayê de hat parvekirin.

Ev parçebûn bi eşkere li tevahiya herêmê belav bû.

Di vê navberê de herêma Kurdistanê (Heartland) di bin kontrola Sovyetê de hat îstismarkirin û li Mukriyanê dewleta komara Kurdistanê hat îlankirin.

Di heman demê de, divê bê zanîn ku komunîzm, fikra çepgiriyê, bi dirûşma birêxistinkirina civaka komunîst bi rakirina xwedîderketina li amûrên îcad, çîna civakî, pere û rewş.

Di vê navberê de li Kurdistanê ji ber serdestiya pergala feodal hem ji ber dewletên dagirker, hem jî ji newekheviya çîn û darayî ya li Kurdistanê mexdûr bûn.

Reiyetên kurd jî ji parvekirina zevî û dewlemendiyê hez dikirin û li gor nivîskarê navdar ê rûs Şoloxov, belavkirina dewar, mirîşk, erd û zevî di nav xelkê de (Zmin No Abad, Sholokhov, 1937) wek tiştekî, Ew adil û erênî xuya bû.

Piştî herifandina dîwarê Berlînê li Almanyayê, nêzîkî sed salî desthilatdariya îdeolojîk a çepgir li ser deverên cîhanê bi dawî bû û welatên komunîst li pey hev dest bi guhertin û reforman kirin.

Partiyên sereke yên Kurdistanê bi giştî xwedî paşerojeke çepgir in û li ser bingeh û mezinahiya çepgiriyê ne.

Tiştê balkêş di vê kurte gotara xwe de ku dixwazim amajê pê bikim ew e ku heta niha partiyên sereke yên Kurdistanê nekarîne cudahiyeke berçav di navbera berê û niha de bikin.




Niha ku li Rojhilata Navîn guhertinên girîng dest pê kirine, ya ku tê dîtin projeyek cidî ye ji bo ji nû ve teşekirina Rojhilata Navîn di bin serokatiya welatên rojavayî (lîberal-kapîtalîst) de.

Niha pirs ew e ku partiyên sereke yên Kurdistanê ku pêşîneyekî çepgir hene, dê çawa xwe bi vê projeya guhertinê re biguncînin?

Ez di wê baweriyê de me ku divê Kurd di dilê pergala nû ya cîhanê û projeya guhertina Rojhilata Navîn de li çareseriya pirsgirêka Kurd bigerin.

Cîhana rojava bi serkêşiya Amerîka pêwîstiya wê bi hêzeke meydanî heye bo çavdêrîkirin û kontrolkirina hevsengiya hêzê li navçeyê û ev jî bê şik Îsraîl e.

Îsraîl ji ber ku hevalbendeke stratejîk a Rojava bi giştî û Amerîka bi taybetî ye, dê li herêmê bibe xwedî hêzeke ewlekarî û leşkerî ya berfirehtir û ji Îslama siyasî û hikûmeta çep re cih nehêle.

Di dîroka partiyên Kurdistanê de gelek xalên krîtîk hene.
Weke rûdana birakujiyê di navbera aliyan de.

Niha hinek ji emîr û leşkerên rêxistinên îslamî yên tundrew Kurd xuya dikin û ev yek dikare paşeroja Kurdan aloz bike.

Bi rastî jî di van çend dehsalên borî de bîrdoziya mezhebî û olî di destê hinek partî û rêxistinan de wek alavekê hatiye bikaranîn ku zirarê bide kurdan.

Me dît ku di navbera partiyeke Marksîst-Lenînîst û partiyeke din a ku weke bûrjûwa dihat pênasekirin de şer derketiye.

Yan jî piştî şoreşa gelên Îranê, girûpeke olî ya Kurd xwe li dijî partiyên laîk pênase kir, û hemû van nakokiyan, astengiyên li pêşiya serkirdayetiya siyasî ya Kurdistanê ji bo dîtina çareyan ji bo pirsa Kurd zêde kirine.

Tişta ku ji min re eşkere ye ew e ku Rojava li Rojhilata Navîn piştgirî nade çepgiran û ev aktor dê nebin hevalbendên lîberal-kapîtalîst ên rojavayî.

Ji ber vê yekê ji bo wan girîng e ku kî li Rojhilata Navîn bibe hevalbendê wan û şûna Seddam Huseyn, Beşar Esed û Xamineyî bigire.

Niha pirsa sereke ew e ku Kurd dixwazin çi bikin?
Partiyên sereke yên çar parçeyên Kurdistanê dê li ser paşxaneya xwe ya çepgir bimînin û vê mîrateya siyasî bidomînin yan dê paradîgmaya xwe ya siyasî biguherînin û wek aktorên siyasî yên Rojhilata Navîn rola xwe bilîzin û xatirê xwe jê bixwazin? ew li çepê ne?

# Piştevan û penaha çeperê



N. Aso Minberî
W. Bêhzad Simko



Lêmêzekirinek bi ser dîroka tejî serweriya netewa Kurd û ew xebat û tekoşînên ku wê netewê bi hemû çîn û qatên vê ve bo gihîştin bi rizgariyê kirine, cîhanek ji xwederbasbûn û qerhemantî û girîngtir ji hemûyan fîdakarî û jixwederbasbûna me dide xuya.

Xebata netewayetî li Kurdistanê, xebateke çendînalî bûye û kesê Kurd hemû hewla xwe bo biencamgihandina vê xebatê bi kar aniye û her vê jî wiha kiriye ku nivş li pey nivş, xwe bi alahilgirê vê xebatê bizanin.

Jiyan zêdebarî hemû cudatîdanînan, hemû jidûrragirinan û hemû astengiyan ku bi sedema jinbûnê pêsîra me girtiye, li vê xebatê de hertim beşa xwe hebûye û bi pêka derfet û rewşan û şiyana xwe, erk li stuyê xwe girtine û hekî bibêjin ku ew jin bûn ku eniya paştir bi hizra netewî perwerder kirin, da ku bi fîdakarî bêne nav meydanê, em şaş neçone.

Jiyana jinan li Kurdistanê, hertim li jêr bandora desthilata sepiyayî de bûye, hekî desthilat, tepeserkirina jinan bi rewa bihesibîne, wê civak jî li jêr vê karlêkeriya dehan navendên bihêz ên desthilatê, givaşa çend qatî xistiye ser jinan û vê yekê jî rola jin kêmrengtir daye xuya.

Berwajiyê xwesta desthilatên sepandî bi ser Kurdistanê de ku hewl dane bi givaşxistin bi ser kesan û bi taybet jinan, ji xebat û tekoşînê dûr bixin, takê Kurd bi giştî li berteknîşandan bi vê xebatê, xwe zêdetir mijûl kiriye û zêdetir li meydanê de bûye.

Rola Jinan li xebata netewatî û tevî hemû lemperên siyasî, civakî, aborî, çandî û perwerdehiyê, nîşanderê vê rastiyê ye ku jin ti car guh biferman û stûxwarê biryar û yasayên dijemirovî yên desthilatdar nebûne û li her derfwetekê de li hember hizra nerast de sekinine.

Her çi qas ku hebûna jinan li refên xebatê de bi berhevdanîn digel berê de gelek guherîn bi ser de hatine û niha rêjeya jinên beşdar li şoreş û xebatê de gelekê zêdetir ji berê ye, lê nabe qet vê rastiyê ji bîr bikin ku ew rêya bo jinên niha heya, bi îrade û fîdakariya jinên nivşa pêştir hatiye xwşkirin, lê xala girîng ev e ku jinên nivşa nû li ser hemen rêbazê lê bi amdebûna zêdetir bi zanist û zanyarî û dîdingeha nû li vê rêbazê de pêngavan hidigrin.

Yek ji taybetmendiyên xebatê ev e ku digel dem û zeman, nûbûn bi xwe ve dîtiye û bi pêka rewşê, guherî ye û ew yek ji wan mijarane ye ku li encama karên jinan tê dîtin, hekî ji li berê de zêdetir piştevan û penaha xebatê bûn û erk li stu digirtin, niha bi piştrastûn bi zanist û pêdegirî ser şiyana xwe, pêgehek qahîmtir dixwaze û hewlê bo gihîştin bi armancên xwe û netewa xwe didin.

Lewma dema ku bas ji xebat û tekoşîna netewî tê kirin, divê bi hûrî mêze li xebata jinên pêşmerge yên li refên xebatê, bê kirin ku bi stugirtina çendîn erkên hevdem, piştevan û penha çeperê û gelek caran pêşengê xebatê bûne û bê hebûna wan, egera vê heye ku li vê xebatê de kêmasiyeke mezin hebe ku bi ti awayek neyê çareserkirin.

Lewma li cihê xwe de ye ku li 26ê Sermaweza îsal de hevdem digel rêzgirtin ji xebat û fîdakariya jinên têkoşer li refên pêşmergetiyê, rêz li qurbanîdana jinên nivşa berê bê girtinê ku bi qurbanîkirina bêmînak a xwe û derbasbûn ji hemû qonaxên dijwar û derbasbûn ji civaka nerîtî, em hînî xweragiriyê kirin da ku bo bidestveanîna mafê netewî û zayendiya xwe, lemper û astengan bişkênin û xwe ji ti xizmetkirinekê neparêzin.

Xebata pêşmergetiya jinan, xwedî nirx e çimkî jina têkoşer û mafxwaz dikare civakê bibizîvîne û baştirîn mamsosta bo nivşa bê be û hînî xweragirikirinê bike.

Hekî Kurdistan îro xwediyê hezaran xortên xwedî îrade û biwêr e ku singê xwe kirine mertal, ew bê guman dayîkek têkoşer bûye ku hînê xweragirî û tekoşînê kiriye û pêşmergane temen û jiyan û paşeroja xwe bo wan fîda kiriye.26ê sermawezê hekî roja rêzgirtin ji Pêşmergeyê Kurdistanê ye, dibe rojek girîng bo rêzgirtin ji cangorîkirin û qurbanîdana dayîkên Kurdistanê be jî ku canfidayane, zarokên xwe pêşkêş bi Kurdistan û bargeha azadiyê kirine.

Xebat û tekoşîna netewiya me, bê hebûn û bê beşdariya jinan, sernakeve û eva rastiyek e ku me li şoreşa "Jîna"yê de bi rohnî ber çavê xwe dît. Dayîkên hişar ku zarokên xwe bê tirs şandine meydana xebatê û hînkirin ku pêşmergane li hember dujmin bisekinin. Lewma rêzgirtin ji 26ê Sermawezê dibe roja rêzgirtin li wan kesane be ku bivêrane û pêşmergane singê xwe dikin mertal û bo rizgariya niştiman, tekoşînê dikin.



# Gotûbêja li ser danasîna çar kitêbên dawî ji berhem û nivîsa Seîd Veroj



N. Seîd Veroj



## Ji Tevgera Neteweyî ya 1925an Portreyên Şophiştî-II

Di vê kitêba bi sernavê “Ji Tevgera Neteweyî ya 1925an Portreyên Şophiştî-II” de, behsa hinek ji serkirde rêvebir û rewşenbîrên tevgera serhildana neteweyî ya 1925an tête kirin.

Tevgera serhildana neteweyî ya 1925an; ji ber bernav û statuya civakî ya pêşeng û serkirdeyên wê, bi giştî ji alîyê çepgiran ve wek tevgereke dînî û kevneperest têtê binavkirin û rexnekirin.

Herweha ji alîyê hinek îslamîyên sîyasî ve jî, tenê wek tevgereke cîhadî û dînî têtê pênasekirin.

Di rastîyê de, herdu alî dixwazin tevgera îstiqlal û rizgarîya Kurdistanê ya sala 1925an, ji naveroka wê ya neteweyî dûr bixin û her yek bi alîyekê ve kirasê xwe yê îdeolojîk lê bikin, ev her du nêrîn jî nerast in.

Tevgera serhildana neteweyî ya sala 1925an, bi amadekarîya rêxistina Cemîyeta Îstiqlal û Îstihlas Kurdistanê (Cemîyeta Serxwebûn û Rizgarîya Kurdistanê) yan jî bi navê xwe yê kurt, ji alîyê “Komîteya Îstiqlala Kurdistanê” weyaxud bi kurteya kurte “Cemîyeta Azadî” ve hatîye amadekirin û serokê vê rêxistinê jî mîralayî Xalid Begê Cibran bû.

Xalid Beg û hevalên xwe di nav pirranîya efkarê umûmîye ya kurdan de xwedî cîyekî pêbawer, miletperwer, dilawer, dilsoz û xemxurê miletê kurd dihatin qebûlkirin.

Xebata Komîteya Îstiqlala Kurdistanê, tirs û tengezarîyek girîng xistibû dilê rêvebirên Cimhurîyeta Tirkiyê û bi rêya hevkarên herêmî navê hinek rêvebir û serokên rêxistinê jî hatibûn destnîşankirin, li benda roj û gava pêkhatina keysê bûn.

Di encama vê dûvçûnê de, ji serkirdeyên rêxistinê Yusif Zîya Beg di 10ê Cotmehê de û paşê Xalid Beg jî di 20ê Qanûna Pêşîn a 1924an de hatin desteserkirin.

Piştî girtina Xalid Beg û Yusif Zîya Beg, barê rêber û serokên mayî bêtir giran dibe û Şêx Seîdê nemir û hevalên xwe xebata rêxistinkirina şoreşê berdewam dikin.

Xebata şoreşê di 13yê Sibata 1925an de bi bûyera Pîranê provake dibe û berîya dema dîyarkirî, tevgera serhildanê dest pê dike.

Piştî ku serhildanê berîya dema dîyarkirî li Pîranê dest pê kir, Şêx Seîd Efendî bû serokê meydanî yê tevgerê.

Serhildana Tevgera Neteweyî ya 1925an, bi keda hemû rêber û serkirdeyên xwe yên hêja, bi rêberî û rêxistinkirina Komîteya Îstiqlala Kurdistanê çêbûye.

Li gor yên berîya xwe du xusûsîyetên cuda yên vê rêxistina nû hebûn: Yekem, ev rêxistin di şiklê cepheyekî neteweyî de hatibû sazkirin û di nav de gelek grubên cuda hebûn; ya duyem, ev rêxistin yekemîn rêxistina îlegal û modrn a wê demê ye ku li ser erdê Kurdistanê hatîye damezrandin û pirranîya kadroyên wê yên navendî li Kurdistanê bûne.

Di vê kitêba ber destê we de, behsa serûwena hinek ji wan pêşeng û serkirdeyan têtê kirin ku ji van kesan pêk tê:

**1- Xalid Begê Cibran**

**2- Şêx Seîd Efendî**

**3- Zeynel Abidîn Fanî**


**4- Seyid Mihemedê Kurê Seyid Evdilqadirê Nehrî**

**5- Şêx Evdirehîmê birayê Şêx Seîd**

**6- Ekremê Mala Cemîl Paşa**

**7- Îhsan Nûrî Paşa**

**8- Omer Awnî Efendîyê Xarpûtî**



## Nerîna



**“Xalid Ezîzî”:**

**“ Weke Hizba Demokrat emê hemû hewlên xwe ji bo afirandina alternatîvekê bidin”**



**“Mezilûm Ebidî”:**

**“Em tekezî li ser pabendbûna xwe ya bi tundî ji bo agirbesteke berfireh li seranserî Sûriyê dikin û em amade ne ku pêşniyara avakirina herêmeke bêçek li Kobanê bikin”**



**“Nêçîrwan Barzanî”:**

**“Erkê me hemûyane ku ji bo parastina aştî û aramiya navçeyê bixebit in”**



**“Saadî Ehmed Pîra ” :**

**“ Girîng e hikûmet û parlamentoyek me hebe ku cihê baweriya gel be”**

# Azadîxwaziya jinan ji kevnar ve heya niha!



**N. Eskender Ceiferî**



Rewşa jinan di hemû serdeman de li welatên cuda, ji hev cuda bûye. Rast e berî hatina Îslamê, çanda xelkê li Îranê cuda bû lê dîsa jî di gelek serdeman de jin rastî zulmê dihatin. Wê demê Kurdistan, beşek ji Îrana nû yan jî welatê Pars ê wê serdemê nebû. Rewşa jinan li welatê Mad û Mezopotamya ji rewşa wan li bal Part hinek çêtir bû.

Di serdema Îlamiyan de asta herî zêde ya serdestiya zilaman tê dîtin. Mafê evîndariyê li bal keçan tine bû. Bav, dikarî rasterast ji keça xwe re hevjînekî hilbijêre û pişt re keça wê, dibû milkê malbata zava. Hexamenişiyan, hinek rewşa jinan baştir kir.

Êdî keç û jinan dikarîn bibin xwediyên milk û malan û ji dayîk yan jî bavê xwe mîratan bigirin. Dîsa jî rê ji wan re nedihate dayîn da ku beşdarî çalakiyên civakê bibin. Heya niha ti kevirnivîseke wê serdemê nehatiye dîtin ku wêneyê jinan li ser wê hebe.

Li Text Cemşîda Farsan mînakek nayê dîtin ku mafê jinan, di wê serdemê de parastî be. Lê li Taqwesana Kurdistanê li bajarê Kirmaşanê wêneyên hin jinan jî tên dîtin. Ev jî dide xuyakirin ku rewşa jinan li Kurdistan yan jî welatê Mad hinek çêtir bûye.

Di serdema Sasaniyan de, yekemîn jin ku karî di posta yekem a rêveberiya welat de cih bigire, Pûranduxt bû.

Ev jî di demekê de bû ku carna welatê Part hewl dida welatê Kurdan dagir bike û hertim pevçûn çê dibûn.

Ev rewş heya serdema Sefewî û Qacaran jî berdewam bû. Mafê jinan, tenê rêvebirina karûbarên malê bû. Jina ku di dema pêryoda heyvane de bi zilamê xwe re razaba, diviyabû bihata kuştin. Ev gotin ji tev desthilatdarên navçeyan re hatibû şandin û dihate bicîkirin.

Yekemîn car piştî 150 salan beriya niha çalakiyên jinan di asta cîhanî de destpê kirin.

Li cografiya siyasî ya Îranê jî di salên di navbera 1905’an de heya 1911’an jinan karîbûn beşdarî şoreşê bibin. Li Kurdistan û Luristanê di wan salan de civat û saziyên veşartî yên jinan hatin avakirin û êdî ew li hemberî desthilatdariyê beşdarî meşên nerazîbûnê dibûn.

Jinan di wê serdemê de ji xwe re grûpên çekdarî ava kiribûn. Jina Lur bi navê Meryem Bextyarî bi çekdarên xwe re çû Tehranê û li hemberî Qezaqan şer kir. Lê tevî hemû kar û xebata wan, yasaya ku di wê şoreşê de hatibû pejirandin, mafên jinan binpê dikirin. Jinan jî weke tawanbaran, nedikarîn di hilbijartinan de deng bidin.

Piştî hatina dîktatorê faşîst bi navê Rizaşayê Pehlewî, rewş hinek hate guhertin. Rizaşa di sala 1933’an de bi Mistefa Kemal Paşa avakerê Komara Tirkiyê re hevdîtin kir. Rizaşa biryar da li zanîngeha Tehranê, jin jî bikarin weke xwendekar beşdarî korsên rojane bibin. Lê tişta xirab ev bû ku wan rê nedida kes hicabê bide serê xwe. Sala 1934’an fermana rakirina hicabê derket. Çapemeniyên jinan rastî givaşê hatin ji bo ku rastiya bûyerê nebêjin. Ev jî, ji xwe binpêkirina mafên jinan bû.

Xelkê, êdî li wî welatî rengê azadiya ol dîtibû lê dîsa jî nedikarîn azadane hîcabê bicî bikin. Eger karê wan bi siyasetê neketa, karê rêjîmê jî bi wan neketibû.

Serdemên herî zêrîn ji bo jinan li Kurdistanê, dema şoreşa Simko, Komara Agirî û Komara Kurdistanê bûn ku di wan serdeman de jin jî tevlî şoreşê bibûn.



Piştî Pehlewiyan, şîeyan bi rêberiya Xumeynî serî hildan. Xumeynî ji sala 1979’an ve piştî ku hate ser kar, dest daniye ser hemû navendên çandî. Êdî jinan nedikarîn bê hicab ji malê derkevin. Wî got Îran welatekî Îslamî ye û ev dîn jî rê nade jinan ku bê hicab bigerin.

Ji wê demê ve heya niha hewlên cudakirina keç û xortan li zanîngehan hene û çendîn zanîngehan jî ev biryar bicî kiriye.

Sala 2007’an beşdariya jinan li Îranê di çalakiyên civakê de ji 93 welatan pileya 87’an hebû. 2009’an Îran weke şeşemîn binpêkara mafên jinan hate binavkirin. Civata Cîhanî ya Aboriyê ragihand ku Îran di nav 134 dewletan de ji bo bikaranîna jinan di postên girîng de ketiye pileya 128’an. Heya niha jî asta dahata zilaman li wî welatî tevî rêjeya bilind a bêkarî û hejariyê, bi qasî nêzî sê caran ji a jinan zêdetir e. Gelek xebatên siyasî hene ku jin nikarin bikin. Ew herwisa nikarin bibin dadwer.

Gelek jin tenê ji ber rexnegirtin ji hicaba bi zorê têne girtin û rastî îşkenceyê tên. Jinek li Îranê ne dikare bibe serokkomar ne jî wezîra yek ji wezaretên girîng.

Ew li wî welatî nikarin ji bo dîtina lîstikan jî derbasî nav stadyomên sporê bibin. Roja cîhanî ya jinan li Îranê qet bi awayekî fermî nayê pêşwazîkirin. Ew kesên ku bi rengekî veşartî jî rêwresman di wê rojê de lidar dixin, ji aliyê saziyên ewlehî ve rastî gefê tên. Roja jinan li Îranê tenê roja mirina Fatime keça pêxemberê Îslamê ye ku têde rêwresmên olî têne lidarxistin.

Lê hisaba Kurdan ciyawaz e. Ji havîna 2022an ve mezintirîn şoreşa jinan di asta cîhanê de li ser destê keçên Kurd bi pêşengiya Jîna Emînî li dijî dagirkariya Tehranê li Kurdistanê dest pê kir û heya niha jî her didome.

# Bandora potansiyela Donald Trump li ser Rojhilata Navîn



N. Dr. Mecîd Heqî



Bandora potansiyela Donald Trump a li ser Rojhilata Navîn mijarek tevlihev û piralî ye, ku ji ber serdema wî ya berê wekî serokê Dewletên Yekbûyî (2017-2021) û her weha dînamîkên siyasî yên herêmê pêk tê.

Ger Trump vegere ser kar an jî bandora xwe li ser siyaseta Dewletên Yekbûyî bidomîne, dê çend deverên sereke bandor bibin, ku hem polîtîkayên wî yên berê û hem jî rewşa jeopolîtîk ya pêşkeftî nîşan dide. Li jêr hin faktorên sereke hene ku meriv li ser bandora Trump li ser Rojhilata Navîn bifikire:

### 1. Têkiliyên Amerîka û Îranê

Tengasiye û Rîska Pevçûn: Kampanyaya “zexta herî zêde” ya Trump a li dijî Îranê, ku bi vekişîna ji peymana nukleerî ya 2015an (JCPOA) û sepandina toleyên tund ve girêdayî bû, kêşeyên di navbera DY û Iranranê de bi awayekî girîng zêde kir.

Ger Trump vegere ser desthilatdariyê, îhtîmal e ku ev polîtîka ji nû ve dest pê bikin, dibe ku xetera pevçûna leşkerî zêde bike.

Trump berê amadebûna xwe nîşan da ku rasterast rûbirûyê Îranê bibe, wek ku bi kuştina General Qasem Silêmanî di sala 2020an de hat dîtin.

Ev yek dikare bibe sedema bêîstiqrariyek zêdetir li herêmê, nemaze ji ber bandora Îranê li Iraq, Sûriye, Lubnan û Yemenê..

Danûstandin an jî tecrîd: Nêzîkatiya Trump a ji Îranê re jî bi nefretbûna ji danûstandinên dîplomatîk re, li şûna wê taktîkên zextê diparêze.

Lêbelê, potansiyela ji nû ve danûstandinên li ser peymanek navokî ya nûvekirî an çarçoveyek ewlehiya herêmî dê bi şert û mercên pêşkeftî ve girêdayî be, di nav de kiryarên Iranranê û çarçoveyek berfireh a navneteweyî.

### 2. Îsraîl û nakokiya Ereb-Îsraîl

• **Piştgiriya Îsraîlê:** Rêvebiriya Trump bi xurtî bi Îsraîlê re li hev kir, Qudsê wekî paytexta Îsraîlê nas kir, balyozxaneya Amerîkî veguhezand wir, û helwestek tund li dijî serokatiya Filistînê girt.

Piştgiriya wî ji serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu re û polîtîkayên rêveberiya wî yên li ser niştecihbûnê wekî gavên sereke ji bo pêşdebirina berjewendiyên Israelsraîl hatin dîtin.

Serdema duyemîn a Trump îhtîmal e ku ev helwesta bihêz a alîgirê Israelsraîl berdewam bike, ku dikare Filistîniyan bêtir ji hev dûr bixe û aloziyên di navbera Israelsraîl û cîranên wê yên ereb de gurtir bike.

• **Peymanên Normalîzasyonê:** Yek ji encamên herî girîng ên karûbarê Trump li Rojhilata Navîn Peymana Birahîm bû, ku peymanên normalîzekirinê di navbera Israelsraîl û çend welatên Ereb de hêsan kir, di nav de Îmarat, Bahreyn, Sûdan û Fas.

Vegera Trump dikare bibe sedem ku bêtir welatên Ereb bi Israelsraîl re têkildar bin, her çend ev bi giranî girêdayî dînamîkên herêmî yên domdar û pirsgirêkên Israelisraîlî-Filistînî be.

Trump dikare zêdetir têkiliyên dîplomatîk û aborî di navbera Israelsraîl û dewletên Ereb de bixebitîne, ku dibe ku helwesta kevneşopî ya Erebî ya li ser Israelsraîl biguhezîne.

### 3. Hebûna Leşkerî û Têkiliyên Dewletên Yekbûyî yên Kendavê bi Dewletên Kendavê re

• **Piştgiriya ji bo Hevalbendên Kendavê:** Nêzîkatiya “Amerîka Pêşî” ya Trump di nav xwe de pêşîgirtina hevkariyên stratejîk bi padîşahên Kendavê re, nemaze Erebîstana Siûdî û UAE re vedihewîne.

Rêvebirîya Trump piştgirîya van rejîman dikir, çekên pêşketî ji wan re difirotin û piştgirîya kiryarên wan yên leşkerî dikir, wek destwerdana Erebistanê li Yemenê.

Vegera ser kar dikare van têkiliyan xurt bike, ku dibe ku bibe zêdebûna hebûna leşkerî ya Dewletên Yekbûyî an piştgirî ji bo armancên herêmî yên van welatan.

• **Vekişîn û Vekêşana Leşkerî:** Serdema yekem a Trump di heman demê de hewildanek dît ku hebûna leşkerî ya Amerîkî li Rojhilata Navîn kêm bike, ji ber ku wî dixwest “şerên herheyî” bi dawî bike û ji nû ve balê bikişîne ser pêşbaziya bi Chinaîn û Rûsyayê re.

Ger Trump vegere ser desthilatê, dibe ku zextek berdewam be ku leşkerên Amerîkî ji welatên mîna Afganîstanê (ku di sala 2021-an de qewimî), Iraq û Sûriyê vekişîne.

Digel ku ev dibe ku di nav bingeha wî ya navxweyî de populer be, ew dikare hevsengiya hêzê li herêmê biguhezîne, potansiyel valahiyek ji hêzên din ên mîna Îran, Rûsya, an Chinaîn re bihêle ku bandorê bikin..

### 4. Sûriye û Pirsgirêka Kurd

• **Sûriye û vekişîn:** Biryara Trump a vekişandina hêzên Amerîkî ji Sûriyê di sala 2019an de, ku hevalbendên Kurd li hember kiryarên leşkerî yên Tirkiyê metirsîdar hiştin, yek ji tevgerên wî yên herî nakok ên Rojhilata Navîn bû.

Kiryarên wî hevalbendên Amerîka li herêmê dûr xistin û hişt ku Îran û Rûsya pêgehên xwe li Sûriyê bihêz bikin. Serdema duyemîn ji bo Trump dikare biryarên bi vî rengî ji bo kêmkirina tevlêbûna Dewletên Yekbûyî li Sûriyê bibîne, her çend ev îhtîmal e ku bêîstîqrariyek bêtir çêbike, di-

Dom:R 9

# Bandora potansiyela Donald Trump li ser Rojhilata Navîn



Doma: R 8

gel ku hêzên reqabetê ji bo bandorê hevrikiyê dikin.

• **Hevpeymanên Kurd:** Siyaseta Trump ya li hember hêzên Kurdî, bi taybetî Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) dê bibe mijareke sereke.

Gelê Kurd ku di şerê li dijî DAIŞ'ê de roleke sereke lîst, dikaribû bi dijwariyên operasyonên Tirkiyeyê û hikûmeta Sûriyeyê re rû bi rû bimîne û her wiha bi îhmalkariya dîplomatîk a berdewam re rû bi rû bimîne.

Siyaseta potansiyela Trump dikare pêşî li kêmkirina tevlêbûna DY di van pevçûnên tevlihev ên herêmî de bigire.

## 5. Polîtîkaya Enerjî û Aborî

• **Dînamîkên Petrol û Enerjiyê:** Nêzîkatiya Trump ji siyaseta enerjiyê re balê dikişîne ser serxwebûna enerjiyê ji bo Dewletên Yekbûyî, bi tedbîrên mîna pêşvebirina hilberîna neft û gazê ya navxweyî (di nav de fracking) û kêmkirina girêdayîbûna DY bi nefta biyanî.

Dibe ku ev nêzîkatî bandorek li hilberînerên nefta Rojhilata Navîn, nemaze OPEC û Erebistana Siûdî kir.

Ger Trump vegere ser kar, dibe ku giraniyek zêde li ser kêmkirina tevlêbûna Dewletên Yekbûyî di ewlehiya enerjiyê ya Rojhilata Navîn de hebe, ku dikare dînamîkên bazara neftê ya cîhanî biguhezîne, her çend hewcedariyên enerjiyê yên Dewletên Yekbûyî û têkiliyên bi hilberînerên neftê yên Kendavê re hîn jî dê rolek sereke bilîzin.

• **Zextên Aboriyê:** Cezayên Trump ên li ser Îranê û zexta wî ya aborî li ser welatên din dibe ku aboriya herêmê bidomîne.

Mînakî, şerê aborî yê rêveberiya wî li dijî Îran, Venezuela û neteweyên din dikare gurtir bibe, ku bibe sedema alozbûna têkiliyên di navbera DY û welatên Rojhilata Navîn.

## 6. Erebistana Siûdî û Şerê li Yemenê

• **Têkiliyên Amerîka û Erebistana Siûdî:** Rêvebiriya Trump bi giranî Erebistana Siûdî ji rexneyên navneteweyî yên li ser binpêkirinên mafên mirovan parast, di nav de kuştina rojnamevan Cemal Xaşiqcî.

Wî her du sedemên aborî û stratejî, bi taybetî li bara nirxê petrolê û ewlehiya navçeyî ya li dijî Îranê, domandina peywendiyên bihêz bi padîşahiya Erebistanê re kir pêşiyê. Vegera Trump îhtîmal e ku ev pêwendiya nêzîk berdewam bike, digel ku Erebistana Siûdî bi potansiyel bandora xwe bikar tîne da ku siyaseta DY di berjewendiya xwe ya herêmî de bimeşîne.

• **Pirsgirêka Yemen:** Trump di destwerdana leşkerî ya Yemenê de li dijî serhildayên Hûsî piştgirî da Erebistana Siûdî. Ev pevçûn bûye sedema karesateke mirovî û bi milyonan sivîl mexdûr bûne.

Ger Trump vegere ser kar, îhtîmal e ku piştgirîya Amerîka ji bo koalîsyona bi pêşengîya Erebîstana Siûdî berdewam bike, şer û bandorên wê yên wêranker li ser gelê sivîl ên Yemenê zêdetir dirêj bike.

## 7. Xebata dijî terorîzmê

• **Sekinîn ser nav birina terorîzmê:** Rêvebiriya Trump giranî da ser têkoşîna li dijî terorê, bi taybetî li dijî DAIŞ û El-Qaîde.

Siyaseta wî li ser tevgera leşkerî ya rasterast bû, û di dema wî de, Dewletên Yekbûyî li Iraq û Sûriyê li ser erdê DAIŞ têk bir.

Dibe ku Trump stratejiyek bidomîne ku pêbaweriya giran bi êrîşên leşkerî, hêza hewayî, û hevkariyên bi hevalbendên herêmî re ji bo şerê li dijî komên mîna DAIŞ dom dike, her çend tercîha wî ji bo vekişîna leşkeran dikare tevlêbûna demdirêj li herêmê sînordar bike..

## 8. Îstîqrara û Bêîstiqrarîya Herêmî

• **Dabeşbûn û nediyarbûn:** Siyaseta derve ya Trump gelek caran bi bêpêşbînîbûn û kiryara yekalî dihate binavkirin.

Digel ku wî karî hin peymanan (wek Peymanên Birahîm) bişopîne, nêzîkatiya wî di heman demê de di nav hevalbend û hevkarên kevneşopî yên Dewletên Yekbûyî de, di nav NATO, YE, û tewra carinan bi dewletên Kendavê re jî parçebûn çandin.

Serdema duyemîn dikare vê bêpêşbînîbûnê girantir bike, ku bibe sedema bêîstiqrariyek mezintir ji ber ku hevalbend û dijber dê ji rêgezên siyaseta Dewletên Yekbûyî ne diyar bin, nemaze di derbarê tevlêbûna demdirêj li herêmê.

## ENCAM

Bandora Donald Trump li ser Rojhilata Navîn îhtîmal e ku ji hêla helwesta wî ya bihêz a pro-îsraîl, nêzîkatiya wî ya rûbirûyî ji Iranranê, tercîha wî ya ji bo kêmkirina tevlêbûna leşkerî ya Amerîkî li herêmê, û piştgiriya wî ji hevalbendên otorîter ên mîna Erebistana Siûdî re çêbibe.

Digel ku sîyaseta wî belkî dê bibe sedema hevbendiyekê bi hin hêzên herêmî re (Îsraîl, Dewletên Kendavê), ew jî dikarin tansiyonên bi taybetî bi Îran, gelê Kurd û hin neteweyên Ereb re gurtir bikin..

### Encamên sereke dê îhtîmal ewane bin:

• Berdewamiya dûrketina Amerîka ji nakokiyên Rojhilata Navîn, dibe ku valahiyan ji hêzên herêmî yên mîna Îran û Rûsyayê re bihêle..

• Bêîstiqrar zêde dibe, bi taybetî eger rageşiya bi Îran û Tirkiyê re zêde bibe.

• Polîtîkayên tundtir, yekalî yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, ku dikare li herêmê dubendî zêdetir bike.

# Cih û bîranîn



**N. Vênûs Fayîq**
**W. Hesen Mukerem**



Li ku derê radiweste, bibe ruhê wê derê "Celaledînê Rûmî"

Bîranînên herî bi qîmet ew in ku em bi zanebûn diafirînin, û ya herî xweş ew in ku em di zarokatiyê de dijiyan, dema ku dilê me bi rastî wek destên me yên zarokatiyê piçûk bû, wusa spî ku çar demsalan berf barî.

Di sala 2015'an a Zayînî de dema ku piştî van salan cara yekem vegeriyam Cezayîrê, welatê mîlyon û nîv şehîdên têkoşîna li dijî dagirkeriya Fransayê, bîranînên min ên zarokatiyê hişyar bûn..

Navê Cemîla Bouherad û Ebdulqadir el-Cezayîrî ku min li Dibistana Navazî El-Hewarî ya Wahranê nas kir, derket pêş.

Li wir yek bi yek bîranînên min ên zarokatiyê hatin bîra min, kolan, mala ku em lê diman, min bi cihê ku min bîranînên xwe yên zarokatiyê lê hiştibû, xizmiyek xurt hîs kir.

Bi rastî tu cihek qîmetek wisa tuneye û heta navê welatekî wernagire ku ne yê mirov be jî, û eger em ji cihan derbas nebin tu bîranînek jî nabe.

Yên ku li her derê tiştekî li dû xwe dihêlin em in, da ku gava em vegerin heman cihî em îhsasa xerîbiyê nekin..

Di wan rêyan de ku em lê meşiyane, cihên ku em jiyane, cihên ku em jê dûr ketine, cihên ku em tê de derbas bûne û em pê hevûdu dîtine, û di romanan de li hûndirî derbas bûne zêdetir bi bîr tînin.

Bîranîn her dem li cihê ku em jiyane hatine afirandin, çi ji hêla fizîkî ve, hem jî ji hêla hestyarî ve, bi rastî, jiyan rêwîtiyek afirandina bîranînan e.

Cih aram e û berevajî demê dimîne, lewra pêwendiya lihevhatî di navbera mirov û mekan de bi demê re nîne, lewra em bi qasî ku bêriya mirovan dikin bêriya cihan dikin.

Cih têkiliyên ferdî-kom-komî ava dike heya ku hûn bi cîhek taybetî re nêzikbûnê hîs bikin jî heke hûn li wir nejîn.

Di jiyanê de, atmosfera navenda ku em tê de dijîn, beşek ji cihê ku em lê dijîn e, berevajî romanên ku cîh dibe beşek ji atmosfera ku hemû bûyerên romanê tê de diqewimin.

Dema ku ez koçber bûm, min di zikê xwe de êşek wisa hîs kir ku ez çu carî cîhê ku lê ji dayik bûme nebînim.

Berî ku ez koç bikim, min di rojnameya Îttîhadê de gotarek bi sernavê "Xwezî bibûma dar" nivîsî.

Min bawer nedikir ku ez ê rojekê ji cihê ku ez lê ji dayik bûme derkevim, lê piştre min têkiliya ku em bi hemû cihan re çêdikin fêm kir.

Wêneyek bi xurtî di hişê min de hebû dema ku ez ji wan deran derketim digel hemî bîranînên wan ên hûrgulî û giran ez neçar bûm ku li rûpela herî spî bigerim da ku ji nû ve dest pê bikim.

Cihê ku ez qet lê nefikirîm, divê ez pê re têkiliyek zindî çêkim.

Mehmûd Derwêş dibêje: "Bêyî bîrê tu peywendiya rast bi cih re nîne."

Bi rastî ger em li cihên ku em tê de derbas dibin ji hebûna xwe re tu bîranînan nehêlin, têkiliya me bi wan re nabe.

Di rastiyê de, têkiliya di navbera mirov û mekan de ne tenê têkiliyek fizîkî ye, di heman demê de têkiliyek ruhî ye Cih di rihê me de cîhanek ku em tê de dijîn diafirînin.



Cihên ku em tê de jiyan e an meşiyane bîranînên wan hene, ku em tê de derbas dibin, ger em ji bîr bikin, ew bi bîr tînin.

Têkiliya di navbera mirov û mekan de ji bilî pîvana wê ya civakî û mirovî, di wateya xwe ya felsefî de li ser hebûn û ezmûnê ye.

Loma jî Celaledînê Rûmî dibêje: Ya Xwedê, canê min vegerîne wî cihê ku ez bê gotin biaxivim.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Sizaya bidarvekirinê bi ser 11 welatiyên Kurd de hatiye sepandin



11 welatên Kurd ji aliyê dadgehên rêjîma Îranê ve sizaya bidarvekirinê bi ser de hatiye sepandin û metirsiya sepandina sizaya bidarvekirinê bi ser 8 welatiyên din ên Kurd de heye.

Rêjîma Îranê bi awayekî nemirovane bi belgeyên sexte û gelek caran bi tohmetên wek "Bexî, îfsad fî erz, miharibe û heta sîxurîkirin" bi îtirafa bi zorê li jêr îşkence û gefxwarinan de sizayê bidarvekirinê bi ser azadîxwazan de bi taybet ên gelê Kurd de disepîne.

Pêka dawî amaran, 6 girtiyên siyasiyên Kurd ên bi navên "Pexşan Ezîzî, Wirîşe Muradî, Hatem Ozdemir, Yûsif Ehmedî, Mihrab Ebdulazade û Hemîd Husênnijad Heyderanlû", bi tohmetên Bexî û Miharibe", sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatiye sepandin û niha li jêr gefa bidarvekirinê li girtîgehên rêjîmê li bajarên "Urmiye, Sine û girtîgeha Êvîn"ê de ne.

Dosyeya 4 ji wan girtiyên siyasî, bo dadgeha bilind a rêjîmê hatine şandin û li benda pêregihîştina dubare bi wan dosyane ne lê sizaya bidarvekirinê ya Hatem Ozdemir û Yûsif Ehmedî, li dadgeha bilind a rêjîmê de hatine erêkirin û eger û metirsiya bidarvekirina wan li demeke nêz de heye.

Herwisa 5 girtiyên din ên siyasiyê Kurd ên bi navên "Şahîn Wesaf, Azad Şucaî, Resûl Ehmed Resûl, Adrês Alî û Nasir Bekirzade" jî bi tohmeta "sîxurîkirin bo Îsraîl" li dadgeha inqilab a rêjmê li bajarê Urmiyê de sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatiye sepandin.

Rêjîma Îranê tevî hemû huşdarîdanên navnetewî, bidarvekirin û sepandina sizaya bidarvekirinê wek alavek bo serkutkirin û tepeseriya zêdetir a xelkê Îranê bi tyaybet gelê Kurd û Belûç, bi kar tîne.

## Rêjîma Îranê li şeqameke bajarê Ciwanroyê de ciwanekî temen 20 salî kuştin



Hêzên hov ên rêjîma Îranê bê agehdarkirina berê, bi teqeya rasterast ciwanekî temen 20 salî yê xelkê bajarê Ciwanroyê, li şeqameke wî bajarî de kuştin.

Pêka rapora "Hengaw"ê, demjimêr 1 û 15 xulekên sibêdeha roja Yekşemî 25ê Sewrmawezê, hêzên hov û serkutker ên întizamî yên rêjîma Îranê li taxa "Babacanî" ya bajarê Ciwanroyê de bê agehdarkirina berê û bi awayê rasterast teqe li maşîna ciwanekî temen 20 salî yê xelkê wî bajarî bi navê "Soheyb Ehmedî" li maşîna wî de kirine û navbirî bi derba 3 gulleyên wan hêzan, demûdest canê xwe ji dest daye.

Pêka rapora Hengawê, yek ji hêzên întizamî ya rêjîma Îranê bi nasnavê "Şahwseysî" bi 3 gulleyan teqe li serê "Suheyb Ehmedî" kiriye û ew kuştiye.

Herwisa Hengawê daye zanîn ku Suheyb Ehmedî karê arayişgeriyê dikir.

Li dema teqekirinê de demûdest canê xwe ji dest daye û termê wî bo nexweşxaneya "Hizretê Resûl" li Ciwanroyê, hatiye veguhastin.

Heta niha hêceta teqekirina wan hêzên hov ên rêjîmê li wî ciwanê xelkê bajarê Ciwanroyê, nehatiye zanîn.

## Rêjîma Îranê li girtîgehên xwe li bajarê Zahidan û Yezdê de zêdetir ji 11 kes bidar vekirin



Li girtîgehên rêjîmê li bajarên {Zahidan û Yezd{ê de zêdetir ji 11 kes hatine bidarvekirin ku yek ji wan welatiyekî Kurd û herwisa jinek jî li nav wan bidarvekiriyan de ye.

Pêka rapora "Hengaw"ê li girtîgeha navendî ya rêjîmê li bajarê Yezdê de 7 kes ku 5 hevwelatiyên Belûç, hevwelatiyek jin û welatiyekî Kurd ê xelkê bajarê Sinê hatine bidarvekirin û li girtêgeha rêjîmê li bajarê Zahidanê de jî 4 kes hatine bidarvekirin ku bi sedema tohmetên pêwendîdar bi madên hişber û kuştina bizanebûn, sizaya bidarvekirinê ji aliyê rêjîma Îranê ve bi ser wan 11 kesan de hatibû sepandin.

"Hengaw"ê navê wan bidarvekiriyan wiha belav kiriye: "Mihemedelî Xarkûhî, Riza Xarkûhî, Ebdulbasit Totazihî, Ebdulnasir Totazihî, Neimetullah Totazihî, Elîriza Gilebçe, Ilyas Terdest, Yeiqûb Berahûyîmeqdem û Mihemedwezîr Rodînî" yên xelkê Belûçistanê bidarvekirin.

herwisa welatiyekî Kurd ê xelkê bajarê Sinê yê bi navê "Selah" temen 37 salî ku nasnavê wî nehatiye zanîn û jinek jî ku nasnameya wê belav nebûyê, hatine bidarvekirin.

Rêjîma Îranê bidarvekirina xelkê Îranê bi taybet gelên "Kurd û Belûç" wek alavek bo serkutkirin û tepeseriya zêdetir bi kar tîne û roj bi roj rêjeya bidarvekirinan û herwisa sepandina sizayên giran bi taybet sizaya bidarvekirinê bi ser xelkê Îranê zêdetir dibe.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (484)